TVÅ SPRÅK ELLER FLERA?

Råd till flerspråkiga familjer

DU ZIMAN YAN JÎ PIRTIR?

Tawsîye ji bo malbatên duzimanî

Nordkurdisk (kurmanji) version

MYNDIGHETEN FÖR SKOLUTVECKLING och SPRÅKFORSKNINGSINSTITUTET I RINKEBY

TVÅ SPRÅK ELLER FLERA? Råd till flerspråkiga familjer

Beställs från:
Liber Distribution
162 89 Stockholm
e-post: skolutveckling@liber.se
tel: 08-690 95 76
fax: 08-690 95 50
Best. nr.:U04:053

Text: Språkforskningsinstitutet i Rinkeby
© Myndigheten för skolutveckling 2004
Översättningar: Haydar Otlu
Foto: Ann Eriksson
Produktion och grafisk form: Ord & Bildmakarna AB, Stockholm
Tryck: Danagårds Grafiska, Ödeshög
ISBN: 91-85128-88-0

Innehåll

Tvåspråkighet – en värdefull resurs ____ 2

Flerspråkiga familjer är olika ____ 2

Kan barn lära sig två eller flera språk lika bra? ____ 4

Vilket språk ska vi tala med vårt barn
då vi föräldrar talar ett annat språk än svenska? ____ 5

Vilket språk ska jag tala med barnet
om vi föräldrar har olika modersmål? ____ 6

Kommer mitt barn att lära sig svenska om jag
fortsätter att tala mitt modersmål med barnet? ____ 8

Är det dåligt om mitt barn blandar språken? ____ 10

Vad ska jag göra
om mitt barn bara svarar på svenska? ____ 12

Vad kan jag göra för att stödja
mitt barns utveckling i modersmålet? ____ 14

Hur kan jag stödja
mitt barns språkutveckling i svenska? ____ 16

Vad ska jag göra
om mitt barn slutar prata i förskolan? ____ 18

Ska mitt barn ha modersmålsstöd i förskolan? ____ 20

Ska mitt barn läsa ämnet modersmål i skolan? ____ 22

Ska mitt barn läsa ämnet
”Svenska som andraspråk” i skolan? ____ 24

Några ordförklaringar ____ 26

För vidare läsning och andra tips ____ 28

Têdeyî

Duzimanîbûyin- îmkaneke bê hempa ye ____ 2

Rewşa hemû malbatên pirzimanî ne wek hev e ____ 2

Gelo ma zarok dikarin du zimanan
yan jî pirtir di heman sewîyeyê de hîn bibin? ____ 4

Ku em dêûbav bêyî swedî bi zimanekî din
dipeyivin, em ê kîjan zimanî hînî zarokên xwe bikin? ____ 5

Ku zimanê me dê û bavan yê zikmakî ji hev cihê
ye, ez ê bi kîjan zimanî bi zarokê/a xwe re bipeyivin? ____ 6

Ku ez bi zimanê xwe yê zikmakî bi zarokê/a
xwe re biaxifim, dê ew dîsa jî swêdî hîn bibe? ____ 8

Gelo ma xerab e,
ku zarokê/a min çend zimanan li nav hev xe? ____ 10

Gelo ez çi bikim,
ku zarokê/a min bes bi swêdî bersiva min bide? ____ 12

Ez çawan dikarim alîkarîya pêşveçûna
zimanê zikmakî yê zarokê/a xwe bikim? ____ 14

Ez çawan dikarim alîkarîya zarokê/a
xwe bikim ku swêdîya xwe bi pêşve bibe? ____ 16

Ez dikarim çi bikim, ku zarokê/a
min li pêşdibistanê dev ji axaftinê berde? ____ 18

Divê zarokê/a min li pêşdibistanê
perwerdeya alîkarî ya zimanê zikmakî bigire? ____ 20

Gelo ma divê ku zarokê/a
min li dibistanê zimanê zikmakîbixwîne? ____ 22

Ma divê ku zarokê/a min li dibistanê be_darî
dersa “swêdîya wek zimanê duyem” bibe? ____ 24

Ravekirina çend peyvan ____ 26

Agahdarîyên pirtir û hin rêberîyên din ____ 28

Tvåspråkighet – en värdefull resurs

De flesta människor i världen är två- eller flerspråkiga.

Två- och flerspråkighet är mycket värdefullt både för den enskilda människan och för samhället. Familjer som flyttat från ett land till ett annat har lättare att hålla kontakten med ursprungslandet om de bevarar sitt modersmål. Barnen i sådana familjer har större möjlighet att ta till sig föräldrarnas kulturarv om de kan föräldrarnas språk.

Den som är tvåspråkig kan också lättare förstå värdet av kulturell mångfald och kan där igenom få en rikare bild av världen.

Modersmålet betyder också mycket för kontakten i familjen och med släktingar, vilket hjälper barnet att känna sig säkrare i sin egen identitet och tillhörighet.

Alla barn kan lära sig två eller flera språk samtidigt, men det är inte så vanligt att man lär sig båda språken lika bra.

För att barnen ska kunna utveckla båda språken till en mycket hög nivå krävs att både hem, förskola och skola aktivt hjälps åt. Det är viktigt att de vuxna i barnens omgivning, på olika sätt, uppmuntrar och stöder användningen av minoritetsspråket. Genom att använda minoritetsspråket – inte bara i familjen, utan också på lekplatsen, i förskolan, i klassrummet och på arbetet – kan föräldrar och lärare konkret visa barnen att det är naturligt med flerspråkighet.

Tvåspråkigheten för med sig så mycket positivt att de flesta familjer som har två eller flera språk aldrig skulle kunna tänka sig att vara utan dem.

Den tvåspråkiga utvecklingen underlättas också om det övriga samhället är positivt till att människor talar flera språk.

Flerspråkiga familjer är olika

Familjer kan vara två- eller flerspråkiga på många olika sätt. Båda föräldrarna kan ha ett gemensamt modersmål som är ett annat språk än svenska, t ex somaliska. En förälder kan ha sitt ursprung i ett land där man talar ett språk hemma och ett annat i skolan, t ex kurdiska hemma och turkiska i skolan. Föräldrarna kanske inte har samma modersmål, utan barnet får redan från början höra två eller tre språk hemma, t ex i en familj med en arabisktalande pappa och finsktalande mamma och kanske föräldrarna använder ytterligare ett annat språk för att tala med varandra, t ex engelska. Alla familjer består inte heller av ”mamma-pappa-barn,” utan också av äldre släktingar som har en aktiv roll i barnens fostran och som kanske också tillför ytterligare språk i barnets värld. Även ensamstående föräldrar kan ibland vilja satsa på tvåspråkighet.

Duzimanîbûyin-îmkaneke bê hempa ye

Piranîya mirovên li cîhanê yan dudo yan jî ji dudoyan zêdetir zimanan dizanin. Duzimanî yan jî pirzimanî bûyin, hem ji bo takekesan hem jî ji bo civakê îmkaneke bê hempa ye. Malbatên ku ji welatê xwe bar dikin û diçin welatekî din, ku zimanê xwe biparêzin, ji wan re hêsantir e ku peywendîyên xwe bi welatê xwe re bidomînin. Ji zarokên ji malbatên ku zimanê dê û bavên xwe dizanin re hêsantir e ku kultura dêûbavên xwe jî biparêzin.

Zarokên duzimanî, bêtir qîmeta civaka pirçandîyê dizanin û di derbarê cîhanê de xwedî asoyeke firehtir in.

Herweha zimanê zikmakî di peywendîyên di nav malbat û xisman de jî roleke wisa girîng dilîze, ku ji aliyê nasname û kok û binyata xwe de zarok xwe piştrasttir hîs dikin.

Hemû zarok di heman demê de dikarin du zimanan hîn bibin. Lê pir ne normal e, ku herdu zimanan di heman derecê de baş hîn bibin.

Ji bo ku zarok bikaribe herdu zimanan di dereceyeke bilind de pêşve bibe; divê dêûbav, peşdibistan û dibistan alîkarîya hev bikin. Divê salmazinên ku li derdora zarok in, bi gelek awayên cuda, alîkarîya zarok bikin, wî/wê teşwîq bikin ku zimanê xwe (zimanê hindikayî) bi kar bîne. Ev yek gelek girîng e. Ku salmezin, ne tenê di nav malbatê de, li cihê lîstikê, li pêşdibistanê, li dersxaneyê û li cihê kar jî zimanê hindikayîyê bi kar binîn, ew nîşanî zarok didin ku pirzimanîbûyin tiştekî xwezayî ye.

Duzimanî bûyin, ewqas tiştên erênî bi xwe re tîne, ku piranîya malbatên ku duzimanî yan jî pirzimanî ne, tu carî nafikirin ku dev ji wan tiştên baş berdin û bêyî wan bijîn.

Ku kesên din yên di civakê de, li hember kesên ku bi du zimanan diaxifin pozîtîf bin, ev jî rê li ber pêşveçûna duzimanîyê xweş dike.

Rewşa hemû malbatên pirzimanî ne wek hev e

Malbat dikarin bi gelek awayên cuda bi duzimanî bin. Dê û bav herdu dikarin bi hev re xwedî zimanekî zikmakî yê hevbeş bin ku ji swêdî cihê be; wek somalî. Ji dê û bav yek dikare ji welatekî be ku li wir di nav malbatê de zimanek tê axaftin û li dibistanê zimanekî din; wek kurdî li malê û tirkî li dibistanê. Mumkun e, dê û bav li malê bi zimanên cihê dipeyivin û zarok di destpêkê de zimanên cihê bibîze; bi numûne; bav erebîaxêf be û dê fînîaxêf be. Û belkî dê û bav bi hev re bi zimanekî sêyemîn diaxifin; mînak îngilizî. Û malbat hemû ji bav, dê û zarok/an jî pêk nehatine. Dikare di malbatê de xizmên temenmezin jî hebin‘û bandoreka wan ya çalak li ser gihandina zarokan hebe. Û loma dikare zimanekî din têkeve jiyana zarokan.

Carna jin yan jî mêrên ku bi tenê dijîn jî dixwazin ku zarokên wan bibin zaroknên duzimanî.

Kan barn lära sig två eller flera språk lika bra?

Ja, men eftersom man ofta använder de olika språken i skilda sammanhang är det vanligt att tvåspråkiga barn klarar vissa ämnesområden och situationer bättre på det ena språket än på det andra. Barnet har kanske lättare att berätta på svenska vad som har hänt i skolan, medan det föredrar sitt modersmål för att tala om sådant som hör familjen till, t ex mat, kläder och släktingar. Barnet kanske använder sitt modersmål i samtal med äldre släktingar och föräldrar men växlar mellan de olika språken när det talar med syskon och kamrater. Sådana språkanvändningsmönster är naturliga för tvåspråkiga individer och brukar förändras under livets gång.

Zarok dikare du yan jî pirtir zimanan bi hev re baş hîn bibe?

Belê, lê ji ber ku gelek caran mirov wan herdu zimanan di cih û rewşên cihê cihê de bi kar tîne; pir normal e, ku zarok bikaribe ji bo hin tiştan yan jî di hin rewşan de ji wan zimanan yekî ji yê din başţir bi kar bîne. Belkî ji bo zarok hêsantir e, ku behsa tiştên ku li dibistanê diqewimin bi swêdî bike, lê tiştên ku malbata wî/wê eleqeder dikin; wek xwarin, cilûberg, xizm bi zimanê xwe yê zikmakî bike. Belkî zarok dema ku bi xizmên xwe yên temenmezin re û dê û bavê xwe re dipeyive zimanê xwe yê zikmakî û dema ku bi xuşk û bira û hevalên xwe re dibeyive ziman diguhere. Li ba kesên duzimanî bi vî rengî bikaranîna zimên tiştekî gelek xwezayî ye û di salên pêş de ev rewş tê guhertin.

Vilket språk ska vi tala med vårt barn då vi föräldrar talar ett annat språk än svenska?

Tala det språk ni behärskar bäst och som ni kan uttrycka er mer nyanserat på. För många är det modersmålet. Det är också lättare att uppfostra sina barn på ett språk som man bättre kan uttrycka sina känslor på. Många vuxna har också lättare att återge sagor och berättelser från sin egen barndom, sjunga sånger eller göra rim och ramsor tillsammans med barnet på det språk de själva talade som barn. Sådana aktiviteter betyder mycket inte bara för kontakten med barnet utan också för barnets allmänna språkutveckling.

Välj det språk som känns naturligast!

Ku em dêûbav bêyî swedî bi zimanekî din dipeyivin, em ê kîjan zimanî hînî zarokên xwe bikin?

Bi wî zimanê ku hûn baştir xwe pê îfade dikin û hûn nuansên wî dizanin. Ji bo gelekan, ev ziman, zimanê wan yê zikmakî ye. Baştir e, ku mirov zarokên xwe bi zimanê ku mirov baştir dikare hestên xwe pê bîne ziman, perwerde bike. Ji bo gelek salmezinan jî hêsan e ku ji zarokan re bi zimanê ku wan di zarokatîya xwe de bi kar anîne bistirên; çîrok û novelan vebêjin û bi wan re mamik û lihevhatinokan çêkin. Çalakîyên weha ne bi tenê ji bo peywendîyên bi zarok re; ji bo pêşveçûna giştî ya zimanê zarok jî girîng in.

Zimanê ku hûn herî xwezayî hîs dikin hilbijêrin?.

Vilket språk ska jag tala med barnet om vi föräldrar har olika modersmål?

Också i familjer där föräldrarna har olika modersmål brukar man rekommendera att var och en använder sitt modersmål tillsammans med barnet. Alltså: En person – ett språk. Barnet har då lättare att vänja sig vid att koppla ihop det ena språket med mamma och det andra med pappa. När hela familjen är tillsammans kan man välja det som känns naturligast; ett av modersmålen, svenska eller något annat gemensamt språk – eller att kombinera flera olika språk.

I familjer där den ena föräldern är svenskspråkig och den andra har ett annat modersmål är det också bra att varje förälder talar ”sitt” språk. Det är troligt att svenskan kommer att bli det dominerande språket i den här typen av familjer, men vill man att barnet ska bli tvåspråkigt är det viktigt att på olika sätt ge extra stöd för utvecklingen i minoritetsspråket.

Ku zimanê me dê û bavan yê zikmakî ji hev cihê ye, ez ê bi kîjan zimanî bi zarokê/a xwe re bipeyivin? .

Mirov ji bo dê û bavên ku zimanê wan yê zikmakî cihê ye jî tawsîye dike ku her yek bi zimanê xwe bi zarok re bipeyivin. Ango: mirovek-zimanek. Wê demê ji bo zarok dibe hêsanîyek ku zimanekî bi diya xwe û yên din jî bi bavê xwe ve girê bide. Dema ku hemû malbat bi hev re be, mirov dikare wî zimanê ku herî xwezayî ye hilbijêre. Ev dikare yek ji zimanên dê£û bavê; swêdî yan jî zimanekî din yê hevbeş be; yan jî mirov dikare gelek zimanên din bi hev re bi kar bîne.

Di malbatên ku ji dayikê yan jî bavê yek swêdî be jî, başţir e, ku her yek ji wan bi “zimanê xwe” bi zarok re bipeyive. Dibe ku di malbatên weha de swedî bibe zimanê serdest. Lê ku mirov bixwaze zarok bibe zarokekî/a duzimanî, divê mirov bi gelek awayên têvel alîkarîyeke zêdetir bide pêşveçûna zimanê hindikayîyê (minoritetsspråk).

Kommer mitt barn att lära sig svenska om jag fortsätter att tala mitt modersmål med barnet?

Ja, det finns till och med forskning som visar att det går bättre att lära sig ett andraspråk om man samtidigt får en god grund i sitt förstaspråk. De båda språken behöver inte konkurrera, utan kan fungera som stöd för varandra. Om barnet har lärt sig ett begrepp på sitt modersmål (t ex gaajaysan på somaliska) är det lättare att lära sig ordet för motsvarande begrepp på svenska (hungrig) och omvänt.

Alla föräldrar önskar att det ska gå bra för deras barn i skolan och därför vill de att barnen tidigt ska lära sig svenska. Men detta betyder inte att föräldrarna ska sluta använda modersmålet när de talar med barnen. Däremot kan föräldrarna hjälpa barnen att få kontakt med det svenska språket. Det bästa sättet för barn att lära sig svenska är att de får använda det tillsammans med svensktalande kamrater och vuxna. Det vanligaste är att detta sker i förskolan och kanske med föräldrarnas vänner och bekanta.

Ku ez bi zimanê xwe yê zimakî bi zarokê/a xwe re biaxifim dê zarokê/a min swêdî hîn bibe?

Belê, hetta hin lêkolîn nîşan didin, ku mirov çiqas zimanê xwe yê yekem ba tir bizanibe, hewqas zimanê duyemîn baştir û hêsantir hîn dibe. Ev herdu ziman alîkarîya pêşveçûna hevûdu dikin. Lewma ne pêwîst e, ku bi hev re têkevin hemberîyê. Ku zarok têgînekê bi zimanê xwe yê zikmakî hîn bûbe (mînak: bi somalî peyva gaajaysan), bersiv yan jî hemberê wê têgînê ya bi swêdî (birçî) hêsantir hîn dibe. Heman tişt ji bo berevajîyê vê yekê jî her weha ye.

Hemû malbat dixwazin ku zarokên wan di xwendina xwe de serketî bin û lewma jî divê zûtir hînî swêdî bibin. Lê ev nayê wê wateyê ku dê û bav dema ku bi zarokên xwe re dipeyivin, zimanê xwe yê zikmakî bi kar neynin. Lê belê divê dê û bav alîkarîya zarokên xwe bikin ku ew bi zimanê swêdî re rûbirû bin. Ji bo zarokan, awayê hînbûna swêdî yê baştir ew e, ku divê di peywendîyên xwe yên bi zarok û salmezinên swêdîaxêf re swêdî bi kar bînin. Ev yeka han, bi awayekî normal li pêşdibistanê û bi peywendîyên bi heval û nasên dê û bavê re çê dibe.

Är det dåligt om mitt barn blandar språken?

Nej, vanligtvis inte. Det är helt normalt att små barn blandar ord från de olika språken i ett och samma yttrande. Detta kan bero på att de ännu inte lärt sig att skilja mellan de olika språken eller på att de saknar ord på det ena eller andra språket.

En annan vanlig företeelse är den mer eller mindre medvetna växling mellan språken som äldre barn och vuxna kan göra, när de talar med andra tvåspråkiga. Denna så kallade kodväxling är något som är naturligt för tvåspråkiga. De utnyttjar helt enkelt möjligheten att växla språk som ytterligare ett uttrycksmedel, för att t ex få fram en viss nyans eller känsla, citera vad någon exakt har sagt på ett annat språk eller för att skapa gemenskap mellan talare av samma språk. Många kan ha svårt att förstå eller acceptera ett sådant språkbruk. De kan tycka att det är dåligt att ”blanda” språken på det sättet och tro att det visar att man inte riktigt behärskar sina språk. Men forskningen visar att det krävs en ganska hög språkbehärskning för att kunna växla mellan språken på ett flytande sätt och att det är både naturligt och funktionellt i tvåspråkigas samtal.

Gelo ma xerab e, ku zarokê/a min çend zimanan li nav hev xe?

Na, bi awayekî giştî na. Gelek normal e, ku zarokên biçûk di axaftinekê de peyvên ji gelek zimanan li nav hev xe. Sedema vê yeka han, dikare ew be ku zarok hîn nikarin ferqê têxin navbera herdu zimanan, yan jî ew peyv di wan zimanan yekî de yan tuneye, yan jî hîn nebûye.

Mirov şêleke din jî li ba zarokên mezin û salmazinên din yên duzimanî dibîne; ew jî ev e, ku dema bi hev re diaxifin bi zanebûneke pir yan jî hindik peyvên zimanên cihê li nav hev dixin û diaxifin. Ev şêl, ku wek “guhertina kodê” tê binavkirin, li ba kesên duzimanî tiştekî pir xwezayî ye. Helbet ew bi vê şêla xwe dixwazin îmkanên guhertina zimanan bi kar bînin û xwe bi awayekî din jî vebêjin, wek nimûne balê bikişînin ser hestekê an jî fikrekê û wê bişidînin, bidin zanîn ku yekî din tam bi zimanekî din çi gotîye, yan jî hevbeşîyekê di navbera kesên ku heman zimanî diaxifin de peyda bikin. Ji bo gelekan zehmet e, ku ziman yan jî axaftineke weha têbigihên, bipejirînin yan jî bi kar bînin. Kesên weha dikarin bifikirin, ku bi vî rengî “linavhevxistin”a zimanan ne tiştekî baş e‘û kesên ku weha dikin zimanên xwe nizanin. Lê lêkolînên zanistî nîşan didin, ji bo ku mirov bikaribe zimanên cihê li navhev nexîne û wan bi awayekî rast biguhere, di dereceyeke bilind de, zanyarîyên zimanî divên. Ev yeka han li ba kesên duzimanî gelek xwezayî û fonksiyonî ye.

Vad ska jag göra om mitt barn bara svarar på svenska?

Det är inte ovanligt att barn under vissa perioder föredrar att använda svenska, även om föräldrarna försöker vara konsekventa och tala sitt modersmål med dem. Om föräldrarna vill att barnet ska bli tvåspråkigt är det viktigt att de fortsätter att använda modersmålet tillsammans med barnet. Det är bra om det också finns jämnåriga kamrater och andra vuxna som använder minoritetsspråket med barnet så att språket fyller en funktion också utanför familjen. I många fall har det visat sig att även om barn inte aktivt använder språket i någon större utsträckning så kan de ändå utveckla en hög passiv förmåga, som grund för att senare lära sig att använda språket också mer aktivt.

Om barnet använder svenska när föräldrarna talar sitt modersmål kan dessa försöka hjälpa barnet genom att svara med de rätta orden och uttrycken på modersmålet. Kontakten och kommunikationen med barnet är emellertid det mest grundläggande, oavsett vilket språk man använder. Det är viktigare att lyssna på vad barnet har att säga, än till hur och vilket språk de väljer att göra det på. Det gäller att vara tålmodig, för det tar tid att överföra sitt språk till barnet i en miljö där svenskan har så stort inflytande och ofta värderas mer.

Gelo ez çi bikim, ku zarokê/a min bes bi swêdî bersiva min bide?

Normal e, ku zarok di hin deman de bikaranîna swêdî tercîh bikin. Ku dêûbav hewl bidin bi awayekî bi îstîkrar bi zarokên xwe re bi zimanê zikmakî biaxifin jî carnan zarok weha dikin. Ku dêûbav bixwazin zarokên wan bibin duzimanî, divê di axaftina bi zarokên xwe re bikaranîna zimanê xwe yê zikmakî berdewam bikin. Ku zarokên di salên wan de yan jî salmezinên ku heman zimanê hindikayîyê bi kar tînin li der dora wan hebin û di axaftina bi wan re zimanê xwe yê zikmakî bi kar bînin baş e. Bi vî rengî ziman li derveyî malbatê jî ji ti tek re dibe, ango fonksîyonekê dibîne. Di gelek rewşan de hatiye dîyarkirin, ku zarok zimanê xwe yê zikmakî bi awayekîşçalak û di qadeka fireh de bikar neynin jî zîrekîyeke pasîf li ba wan peyda dibe. Ev yeka han, ji bo ku di pêşerojê de, bi awayekî çalaktir, zimanê xwe yê zikmakî bi kar bîne, dibe bingehek.

Dema ku zarok swêdî bi kar tînin, lê dê û bavên wan bi zimanê xwe yê zikmakî diaxifin, divê dê û bav bi peyv‘û têgînên rast bersiva wan bidin, ev dikare ji zarokan re bibe alîkar. Lê mirov kîjan zimanî bi kar tîne bila bîne, dîsa jî peywendîyên bi zarokan re, ji bo hînbûna zimên, bingehên pir girîng in. Ji vê girîngtir jî ev e, ku divê mirov guhê xwe bide ka zarok dixwaze‘çi bibêje; ev ji çawan dibêje û ji bo tiştê ku dixwaze bêje kîjan zimanî hildibijêre girîngtir e. Ji bo ku mirov zimanê xwe hînî zarokên xwe bike wext divê. Divê mirov bi sebir be.

Zarok di jîngeheke wisan de dijîn ku hem bandora swêdî gelek mezin e hem jî gelek caran nirxek bilindtir ji bo swêdî tê dayin.

Vad kan jag göra för att stödja mitt barns utveckling i modersmålet?

Turkiska barn i Turkiet och svenska barn i Sverige lär sig sitt modersmål i många olika situationer och med många olika människor; i familjen, tillsammans släkt och vänner, på gården, i affären, på bussen, i förskolan och i skolan. Hela dagen har de möjlighet att höra, tala och lära sitt modersmål. Många minoritetsbarn har mycket mer begränsade möjligheter för sin modersmålsutveckling. För flertalet är det framför allt i hemmet som barnet hör och använder modersmålet. Det ställer förstås större krav på föräldrarna att, tillsammans med förskolan och skolan, vidga barnens kontakter på modersmålet. Tillsammans måste de vuxna i barnens omgivning skapa möjligheter för barnen att få använda sitt modersmål så mycket som möjligt både i och utanför familjen, både tillsammans med jämnåriga och tillsammans med vuxna.

De allra flesta kommuner har verksamhet för föräldrar med hemmavarande barn i den s.k. öppna förskolan. Dit kan man gå för att träffa andra föräldrar och barn. I många kommuner erbjuder också biblioteken sagostunder på olika modersmål. Biblioteken har också barn- och ungdomsböcker på många olika språk att låna ut. Fråga i din kommun vilka möjligheter som finns där.

Ez çawan dikarim alîkarîya pêşveçûna zimanê zikmakî yê zarokê/a xwe bikim?

Zarokên tirk li Tirkîyê û zarokên swêdî li Swêdê di gelek rewşên têvel de û di peywendîyên bi gelek mirovên cihê de hînî zimanê xwe yê zikmakî dibin; bi peywendîyên nav malbatê, xizm û heval, li baxçe, li dûkanê, di otobusê de, li pêşdibistan û dibistanê. Ji sibehê heta êvarê îmkanên wan hene ku zimanê xwe bibihîzin, bipeyivin û hîn bibin. Lê îmkanên pêşvebirina zimanê zikmakî ji bo gelek zarokên hindikayîyan bi sînorkirî ne. Piranîya van zarokan bi tenê di mala xwe de zimanê xwe dibihîzin û bi kar tînin. Ev berpisîyarîyeke mezin dixe ser milê dêûbavan, ku bi hevkarîya pêşdibistanê û dibistanê, îmkanên cihên peywendîyan bi zimanê xwe re peyda bikin ku zarok bikaribin zimanê xwe yê zikmakî bi kar bînin.

Divê ew salmezinên ku li derdora zarok in, bi hev re, ji bo zarok îmkanan peyda bikin, ku zarok bikaribe hem di nav malbatê de hem jî li derveyî malbatê, hem bi hevtayên xwe re hem jî bi salmazinan re zimanê xwe pirtir bi kar bîne. Li gelek şaredarîyan, ji bo dêûbavên ku bi zarokên xwe re li malê ne, çalakîyên cihê cihê hene; wek pêşdibistana vekirî. Mirov dikare biçe wir û bi dêûbavên din û zarokên wan re hevûdu bibîne. Dîsa li gelek şaredarîyan, li pirtûkxaneyan, bi gelek zimanên zikmakî yên cihê demên çîrokxwendinê tên organîzekirin.. Herweha li pirtûkxaneyan bi gelek zimanên cihê pirtûkên zarok û xortan hene ku mirov dikare deyn bike. Li şaredarîya xwe bipirse, ka kîjan îmkan li wir hene.

Hur kan jag stödja mitt barns språkutveckling i svenska?

En bra grund för barnets utveckling i svenska är ett gott samarbete mellan förskolan och skolan och föräldrarna. Förskolan och skolan har ett stort ansvar för barnens utveckling i svenska men föräldrarna kan också hjälpa till på olika sätt. Framför allt genom att uppmuntra barnens skolarbete på olika sätt. Också om föräldrarna inte kan så mycket svenska kan de hjälpa till med skolbarnens läxläsning.

Många föräldrar undrar hur deras barn kan lära sig svenska när barnen inte har några svenska kamrater att umgås med. Det finns minst två saker som föräldrar bör fundera på. För det första gäller det att på olika sätt skapa tillfällen för barnen att träffa personer som talar svenska. Det viktigaste är att barnet får många olika tillfällen att använda svenska tillsammans med kamrater och andra vuxna – det spelar mindre roll om dessa personer har svenska som modersmål eller inte. Föräldrarna kan t ex stimulera barnen att delta i aktiviteter där de kommer i kontakt med svensktalande barn såsom fotbollslag, körer, dansgrupper eller liknande.

För det andra gäller det att fundera på vilken förskola/skola som kan vara lämplig för barnet. Föräldrarna har rätt att ställa krav på att pedagogerna i såväl förskolan som skolan har en stor medvetenhet och kunnighet om tvåspråkig utveckling, andraspråksinlärning och hur man lär sig på ett andraspråk. Föräldrarna har också rätt att kräva att pedagogerna arbetar på ett sätt som gagnar deras barns språkutveckling, både på modersmålet och på svenska.

Ez çawan dikarim alîkarîya zarokê/a xwe bikim ku swêdîya xwe bi pêşve bibe?

Ji bo bingeheke baş ya pêşketina swêdî, hevkarîyeke baş ya di navbera malbat, pêşdibistan û dibistanê de şert e. Di pirsa pêşvebirina swêdîya zarokan de, berpirsîyarîyeke mezin li ser milê pêşdibistan û dibistanê ye, lê dêûbav jî dikarin bi gelek awayan alîkarîyê bikin. Berî hertiştî dêûbav dikarin bi awayên cuda zarokan teşwîqî xebata dibistanê bikin. Ku dêûbav başswêdî nizanibin jî, dikarin alîkarîya wan ya xwendina dersa malê bikin. Ango zarok dikarin ji wan re bixwînin û ew guhdar bikin.

Gelek dêûbav, meraq dikin, gelo ku hevalên zarokên wan tunebin, ew dê çawan swêdî hîn bibin? Bi kêmasî du tişt hene, ku divê dêûbav li ser bifikirin. Tiştê yekem ev e, ku divê malbat, bi gelek awayan rê li ber zarokan xweş bikin ku bikaribin bi kesên ku bi swêdî diaxifin re peywendîyê deynin. Grîngtirîn tişt ew e, ku zarok gelek keysên hevdîtinê bi dest bixîne û di vê hevdîtinê de bi heval û salmazinan re swêdî bi kar bîne. Pir ne girîng e, ku zimanê van mirovan yê zikmakî swêdî be yan na. Mînak: dêûbav dikarin zarokên xwe teşwîq bikin ji bo ku herin cihên ku kesên bi swêdî diaxifin lê hene; wek tîmên fûtbolê, koroyên muzîkê, grûbên dansê û hwd.

Tiştê duyem jî ev e, ku dêûbav bifikirin, gelo kîjan pêşdibistan/dibistan ji zarokê/a min re başтir e. Mafê dêûbavan heye ku ji pêşdibistanê û dibistanê bipirsin ka mamosteyên wan di warê pêşveçûna duzimanîbûyin û hînkirina zimanê duyemîn de hişyar û xwedî zanebûnê ne yan na. Herweha dêûbav dikarin ji pêşdibistan û dibistanê daxwaz bikin, ku divê perwerdekar bi awayekî wi-

san bixebitin ku ev awa bikaribe xizmeta pêşdeçûna zimanê zikmakî û swêdîya zarokkê/a wan bike.

Vad ska jag göra om mitt barn slutar prata i förskolan?

Vänta lite och se. Ibland när ett barn börjar i en förskola där modersmålet inte används, kan det hända att en så kallad ”tyst period” inträffar och barnet inte säger någonting på svenska under lång tid. Det är ingen fara om barnet verkar må bra i övrigt och om det kommunicerar på annat sätt under den här tiden, t ex genom att peka, visa vad det vill och förstås fortsätter att tala sitt modersmål hemma. Hela tiden samlar barnet kunskap om det nya språket även om det inte märks utåt. Oftast börjar barnet tala efter en periods tystnad, då det samlat tillräckliga kunskaper om det nya språket. Små barn mår dock bra om de märker att även deras modersmål används och uppskattas i förskolan.

Ez dikarim çi bikim, ku zarokê/a min di pêşdibistanê de dev ji axaftinê berde?

Demekê bipê û binêre ka çi dibe. Carnan dema ku zarok dest bi pêşdibistaneke ku li wir zimanê zikmakî nayê bikaranîn, dikin; demeka ku bi navê “dema bêdeng” tê binavkirin dest pê dike û zarok demeke dirêj, bi swêdî tu tiştekî nabêje. Ev ne tiştekî ku mirov jê bitirse, ku wekî din tendirustîya zarok baş be û di vê demê de bi awayekî din peywendîyên xwe bidomîne, bi awayê ku tiştan nîşan bike, dîyar bike ku çi dixwaze û ku helbet li malê bi zimanê xwe yê zikmakî biaxife. Bi awayekî eşkere li derve xuya neke jî zarok her tim di derheqê vî zimanê nû de zanyarîyan dicivîne. Zarok, pirî caran, piştî vê dema bêdeng, têra xwe zanyarî civandin şûn de diaxife. Li gel vê yekê jî, dema ku zarokên biçûk dibînin ku zimanê wan yê zikmakî li pêşdibistanê tê pejirandin û bikaranîn xwe baş hîs dikin.

Ska mitt barn ha modersmålsstöd i förskolan?

För att klara skolan och få en bra framtid i Sverige är naturligtvis goda kunskaper i svenska av avgörande betydelse. Men inlärningen av svenska behöver inte ske på modersmålets bekostnad. Forskningen har visat att det snarare är tvärtom; barn som får möjlighet att utveckla sitt modersmål i förskolan och skolan får också ofta bättre kunskaper i svenska och i andra skolämnen. Modersmålsstödet i förskolan kan fungera som en bro mellan hemmet och förskolan. Det ger också barnet en värdefull möjlighet att vidareutveckla sitt modersmål samtidigt som barnet utvecklar svenska som ett andraspråk.

Det är ganska vanligt att barn som har ett annat modersmål kommer i kontakt med svenskan först i förskolan. Ibland kan det finnas tvåspråkiga förskolor eller tvåspråkiga avdelningar för barn med samma modersmål. Där finns det både svenskspråkig personal och personal som talar barnets modersmål. Föräldrarna bestämmer själva om de vill ha sina barn på en sådan förskola.

Om barnet går i svensktalande grupp kan föräldrarna ansöka om modersmålsstöd. Då kommer en modersmålstränare (som förut kallades hemspråkstränare) till förskolan och pratar, leker och läser sagor med barnet på modersmålet. Fråga din förskola eller ansvarig tjänsteman i din kommun om vilka möjligeter som erbjuds.

Gelo ma divê ku zarokê/a min di pêşdibistanê de perwerdeya alîkar ya zimanê zikmakî bigire

Helbet ji bo ku mirov li Swêdê di dibistanê de serketî be û bibe xwedîyê pêşerojeka başzanebûna zimanê swêdî roleke sereke dilîze. Lê ne pêwîst e, ku hînbûna swedî li ser windakirina zimanê zikmakî bê avakirin. Lêkolînên zanistî tam berevacîyê vê nîşan didin. Li gor van lêkolînan, zarokên ku di pêşdibistan û dibistanê de îmkanên pêşvebirina zimanê xwe yê zikmakî bi destxistine, pirî caran, di swêdî û dersên xwe yên din de jî serketîtir in. Di pêşdibistanê de perwerdeya alîkar ya zimanê zikmakî dikare di navbera malê û pêşdibistanê wezifeya pirayekê bibîne. Herweha ew perwerde îmkanên bêhempa dide zarokan ku di pêşerojê de hem zimanê xwe yê zikmakî, hem jî wek zimanê duyemîn, swêdîya xwe pêşve bibin.

Pirî caran zarokên ku bêyî swêdî xwedî zimanekî zikmakî yê din in, cara pêşî li zarokxaneyê pêrgî swêdî dibin. Carnan dikare ji bo zarokên ku heman zimanî diaxifin pêşdibistanên duzimanî yan jî di pêşdibistanê de be_ên duzimanî hebin. Li wir hem personalên swêdîaxêf hem jî yên ku bi zimanê zarok diaxifin hene. Dêûbav bi xwe biryarê din, ku dê zarokên xwe bişînin pêşdibistaneke weha yan na.

Ku zarok di pêşdibistanê de diçe nav grûbeke ku bi swêdî diaxifin, dêûbav dikarin jê re perwerdeya alîkar ya zimanê zikmakî bixwazin. Wê demê dê mamosteyekî/a zimanê zikmakî, ku berê jê re digotin mamosteyê zimanê malê, were pêşdibistanê û bi zimanê zikmakî bi zarok re biaxife, bilîze û jê re çîrokan bixwîne. Ji berpirsîyarê şaredarîyê yan jî ji pêşdibistana xwe bipirse, ka wan çi îmkan hene.

Ska mitt barn läsa ämnet modersmål i skolan?

Forskning visar att tvåspråkiga barn som lärt sig läsa och skriva på sitt modersmål har lättare att utveckla och bevara det. Det bästa vore om alla barn först fick lära sig att läsa och skriva på sitt starkaste språk, som för många barn är modersmålet. Förmågan att läsa och skriva på ett språk underlättar sedan läsinlärningen på andra språk. Barn kan även lära sig läsa och skriva samtidigt på flera språk. I skolans modersmålsundervisning får barnet möjlighet att lära sig läsa och skriva på sitt modersmål. Genom att till exempel skriva brev, läsa böcker och annat skrivet material kan barnet fortsätta och utöka kontakten med ursprungslandet.

I skolan har barnet rätt till undervisning i modersmålet. Det måste finnas minst fem barn i kommunen för att bilda en grupp för modersmålsundervisning (tidigare kallad hemspråksundervisning). Om barn med samma språk går i olika skolor, samlar man dem på en skola under de timmar som modersmålsundervisningen sker. Undervisningen är frivillig och därför måste föräldrarna anmäla till skolan om de vill att barnet ska ha modersmålsundervisning. Om barnet inte kan så mycket svenska, har barnet också rätt att få studiehandledning på modersmålet. Det betyder att barnet får hjälp av en modersmålslärare i olika skolämnen. Läraren förklarar på modersmålet innehållet i det som klassen arbetar med och hjälper barnet i skolarbetet. Skolan bestämmer om barnet ska få studiehandledning.

Det finns också andra sätt att studera modersmålet. Fråga din skola vilka möjligheter som erbjuds och vad de innebär. För några språkgrupper och på några orter finns det t.ex. möjlighet att välja tvåspråkig undervisning i form av tvåspråkiga klasser eller språkligt inriktad friskola.

Gelo ma divê ku zarokê/a min di dibistanê de zimanê zikmakî bixwîne?

Lêkolîn nîşan didin, ku ji bo zarokên duzimanî yên ku bi zimanê xwe yê zikmakî hînî xwendin û nivîsînê bûne, hêsantir e ku vî zimanê xwe pêşve bibin û biparêzin. Dê başтir bibûya ku hemû zarokan, berê bi zimanê xwe yê herî bi hêztir hînî xwendin û nivîsînê bibûyana. Helbet ev ziman ji bo gelekan zimanê zikmakî ye. Karîna xwendin û nivîsîna bi zimanekî; paşê hînbûna zimanekî din jî hêsantir dike. Herweha zarok dikarin di heman demê de hînî xwendin û nivîsîna bi gelek zimanan bibin. Zarok, bi perwerdeya zimanê zikmakî ya xwendegehan, hînî xwendin û nivîsîna bi zimanê xwe yê zikmakî dibin. Zarok bi saya nivîsîna nameyan, xwendina pirtûkan û materyalên nivîskî yên din dikarin bi welatê xwe yê ku jê tên, peywendîyên xwe berdewam bikin pêşve bibin.

Li xwendegehê mafê zarok heye ku beşdarî perwerdeya zimanê zikmakî bibe. Ji bo ku, grûbek bo zimanê zikmakî bê avakirin, divê di heman şaredarîyê de pênc zarok hebin. Zarokên ku heman zimanî diaxifin, ku biçin xwendegehên cihê, mirov dikare di dema perwerdeya zimanê zikmakî de wan li xwendegehekê bicivîne. Perwerdeya zimanê zikmakî bi dilxwazîya dêûbavan e. Lewma dêûbavên ku dixwazin zarokên wan beşdarî perwerdeyê bibin divê serî li dibistanê bidin. Her weha ku zarok baş swêdî nizanibe, mafê wî/wê heye ku bi zimanê zikmakî jê re alîkarî bê kirin. Ji vê alîkarîyê re perwerdeya alîkar yan jî rêberî tê gotin. Bi vê perwerdeyê, mamosteyê zimanê zikmakî di gelek beşan de alîkarîya zarokan dikin. Bi vê perwerdeyê tiştên ku di polê de li ser tê xebitandin û zarok ji naverokê fêm nake, ji mamosteyê xwe yê zimanê zikmakî alîkarîyê werdigire. Xwende-

geh biryarê dide, ku zarok dê dersa alîkarîyê werbigire yan na.

Di xwendegehê de gelek awayên perwerdeya zimanê zikmakî yên din jî hene. Ji xwendegeha xwe bipirse, ka çi îmkan li ba wan hene û çawan pêk tên. Ji bo hin zimanan, li hin cihan, îmkana hilbijartina perwerdeya duzimanî ya di polên duzimanî de yan jî xwendegehên taybetî yên ku ji bo ziman hatine araste kirin hene.

Ska mitt barn läsa ämnet ”Svenska som andraspråk” i skolan?

I skolan kan man studera svenska antingen inom ämnet ”Svenska” eller inom ämnet ”Svenska som andraspråk”. Vilket av dessa ämnen som ditt barn bör läsa beror på vilka färdigheter i svenska som barnet har när det börjar skolan. Barn med ett annat modersmål än svenska har ju oftast inte hunnit lära sig lika mycket svenska som svensktalande barn när de börjar skolan. Då är det viktigt att barnet får en språkundervisning som utgår från just detta barns kunskaper och behov. Om barnet inte får bra hjälp att hämta in det språkliga försprång som de svensktalande barnen har, finns det risk att barnet får svårt att komma ikapp de andra. Och det kan påverka hur man klarar sig i de andra ämnena i skolan.

Målet för ämnet ”Svenska som andraspråk” är att eleverna ska uppnå samma nivå i svenska som elever med svenska som modersmål. Läraren i ”Svenska som andraspråk” vet vad som kan vara svårt för elever som inte har svenska som modersmål. Därför kan läraren anpassa undervisningen mer efter de enskilda elevernas kunskaper och behov. Undervisningen i ”Svenska som andraspråk” ska göra det möjligt för eleverna att använda svenskan som ett redskap för att tänka och för att uttrycka sig i tal och i skrift. Eleven ska också, vid sidan av modersmålet, kunna använda svenska språket som ett effektivt redskap för att inhämta kunskaper i andra ämnen.

Ofta bedrivs undervisningen i ”Svenska som andraspråk” i mindre grupper. Det ger eleverna bättre möjligheter att öva språket och läraren har mer tid och utrymme för varje elev. Till skillnad från undervisningen i en stor klass kan eleverna här oftare få komma till tals. I en mindre grupp är det också lättare att våga fråga och be läraren om hjälp när man inte förstår eller har svårt att hitta de rätta orden och uttryckssätten.

Fråga på ditt barns skola hur de bedriver undervisningen för tvåspråkiga elever både i ämnet ”Svenska som andraspråk” och i skolans övriga ämnen.

Gelo ma divê ku zarokê/a min di xwendegehê de beşdarî dersa "swêdîya wek zimanê duyem" bibe?

Li xwendegehê mirov dikare, swêdî, yan di beşa "swêdî" de bixwîne yan jî di beşa "swêdîya wek zimanê duyemîn" de bixwîne. Ji van kîjanan zarokê/a te dikare bixwîne, girêdayî dema ku zarokê/a te dest bi dibistanê dike, çiqas bi swêdî dixwîne. Pirî caran zarokên ku zimanê wan yê zikmakî ne swêdî ye, dema ku dest bi dibistanê dikin hîn pê re negihandine ku bi qasî zarokên swêdîaxêf swêdî hîn bibin.Wê demê girîng e ku zarok beşdarî perwerdeyeke zimên bibe, ku li gorî pêwîstî û daraxa zanyarîyên wî/wê yên zimên be. Ku zarok di wextê de alîkarîyeke baş wernegire, xeterî heye ku di pêşerojê de nikaribe ferqa di navbera xwe û zarokên swêdîaxêf de ji holê rake. Ev dikare di dibistanê de li ser serketina di waneyên din de jî bandorê bike.

Armanca waneya "swêdîya wek zimanê duyemîn" ew e, ku zarok di swêdî de bigehên daraxa zarokên swêdîaxêf. Mamosteyên "swêdîya wek zimanê duyemîn" dizanin, ji bo zarokên ku zimanê wan yê zikmakî ne swêdî ye çi zehmet e. Lewma ev mamoste dikarin pirtir wan zarokan li gor pêwîstî û daraxa wan ya taybetî perwerde bikin. Perwerdeya "swêdîya wek zimanê duyemîn", dê rê li ber şagirdan veke, ku ew bikaribin swêdî wek alavekê bi kar bînin û pê bifikirin û xwe bi nivîskî û devkî pê îfade bikin. Her weha şagird dê bikaribin, li gel zimanê zikmakî, swêdî jî wek alavekê bi kar bînin ku, ji bo dersên din, pê zanyarîyan bi dest bixînin.

Perwerdeya "swêdîya wek zimanê duyemîn", gelek caran, di grûbên biçûktir de tê dayin. Ev ji bo şagirdan îmkanên baştir peyda dike ku ew bikaribin baştir zimên temrîn bikin û ji bo mamosteyan jî pirtir wext çêdibe ku bikaribin wê wextê li gor pêwîstîya her şagirdî bi kar bînin. Di van grûbên biçûktir de îmkana şagirdan ya axaftinê ji ya polên mezin pirtir e. Her weha dema ku mirov tiştekî fêm neke yan jî peyvên rast neyên bîra mirov, di grûbên biçûktir de hêsantir e ku mirov cesaret bike û bipirse, ji mamoste alîkarîyê bixwaze.

Ji dibistana zarokê/a xwe bipirsa, ka ew perwerdeya "swêdîya wek zimanê duyemîn" û beşên dibistanê yên din çawan dimeşîni

Några ordförklaringar

Andraspråk: Det eller de språk som börjar läras in efter förstaspråket. Det är inte alltid lätt att dra gränsen mellan förstaspråk och andraspråk. När det gäller ett barn som börjar lära sig ytterligare ett språk i mycket tidig ålder kan man säga att barnet har två förstaspråk.

Förstaspråk: Det eller de språk som ett barn börjar lära sig först.

Hemspråk: Begreppet ”hemspråk” uppkom i samband med den så kallade hemspråksreformen som började genomföras 1977. Hemspråksundervisning kallas numera modersmålsundervisning. Barn har rätt till modersmålsundervisning om någon av föräldrarna eller vårdnadshavarna har ett annat språk än svenska som modersmål och om man använder språket dagligen med barnet.

Majoritetsspråk: Det största och dominerande språket i landet. I Sverige är svenska majoritetsspråket.

Minoritetsspråk: De språk som talas av delar av befolkningen. I Sverige finns fem officiella inhemska minoritetsspråk, *finska, jiddisch, meänkieli, romani chib* och *samiska* och ett mycket stort antal språk som talas av nytillkomna minoriteter, t ex *arabiska, danska, kurdiska, persiska, turkiska* och *somaliska.*

Modersmål: Termen ”modersmål” är ett mångtydigt begrepp, men vanligtvis menar man det/de första språk som lärs in i hemmet.

Tvåspråkighet: Termen ”tvåspråkighet” används ofta som samlingsterm för ”två- eller flerspråkighet”.

Ravekirina çend peyvan

Zimanê duyem: Ew ziman yan jî zimanên ku mirov piştî zimanê yekem hîn dibe. Mirov hertim nikare di navbera zimanê yekem û duyem de sînorekê bikêşe. Herçî zarok e, ku di biçûktîya xwe de dest bi zimanekî din bike, mirov dikare bêje ew zarokekî/a xwedî duzimanan e.

Zimanê yekem: Ziman yan jî zimanên ku zarok pêşîn hîn dibe.

Zimanê malê: Têgîna "zimanê malê", bi reforma ku jê re "reforma zimanê malê" tê gotin di sala 1977an de hat bicihkirin, derket holê. Niha di şûna "zimanê malê"de têgîna zimanê dayikê tê bikaranîn. Ku yek ji dêûbêvê zarok yan jî welîyê wî/wê, bi zarokê/a xwe re bêyî swêdî, wek zimanê zikmakî, bi zimanekî din biaxife û vî zimanî wek zimanê rojane bi kar bîne, mafê zarok heye ku beşdarî perwerdeya zimanê zikmakî bibe.

Zimanê piranîyê: Mezintirîn zimanê ku di welêt de tê axaftin û serdest e.

Zimanê hindikayîyê: Ew zimanên ku ji aliyê hin be_ên civakê tên axaftin. Li Swêdê pênc zimanên hindekayîyan yên fermî hene; wek fînî, îbranî, meankîelî, romanî (chîpî) û laponî ne.Bêyî van jî gelek zimanên din ku ji alîyê grûbên ku nû hatine swêdê ve tên axaftin; wek erebî, danmarkî, kurdî, farisî, tirkî û somalî.

Zimanê zikmakî (Zimanê dayikê): Têgîna "zimanê zikmakî", têgîneke pirwate ye. Lê di wateya zimanê yan jî zimanên ku mirov pêşîn li malê hîn dibe de tê bikaranîn.

Duzimanî: Têgîna duzimanî, pirî caran wek têgîneke hevbeş ji bo kesên ku dudo yan jî ji dudoyan pirtir zimanan dizanin tê bikaranîn.

För vidare läsning

Arnberg, Lenore (1988), *Så blir barn tvåspråkiga. Vägledning och råd under förskoleåldern*. Stockholm: Wahlström & Widstrand. (Boken finns också översatt till arabiska, engelska, finska och spanska.)

Baker, Colin (1996), *Barnets väg till tvåspråkighet: råd till föräldrar och lärare i förskola och grundskola*. Uppsala: Påfågeln.

Hyltenstam, Kenneth (red.) (1996), *Tvåspråkighet med förhinder? Invandrar- och minoritetsundervisning i Sverige*. Lund: Studentlitteratur.

Hyltenstam, Kenneth (red.) (1999), *Sveriges sju inhemska språk – ett minoritetsperspektiv*. Lund: Studentlitteratur.

Andra tips

För den som har tillgång till Internet (finns bl.a. på alla bibliotek) finns mycket information att hämta om tvåspråkighet i familjen och i skolan.

Om modersmålsundervisningen i förskolan och skolan kan man läsa på Tema Modersmål som ligger på Skoldatanätet. Där finns också särskild information riktad till föräldrar och till barn.
http://www.skolutveckling.se/mangfald

Mer information om svenska som andraspråk finner man bl.a. på Nationellt centrums hemsida:
http://www.lhs.se/sfi

Ji bo agahdarîyên zêdetir çavkanîyên din

Arnberg, Lenore (1988), *Så blir barn tvåspråkiga. Vägledning och råd under förskoleåldern*. Stockholm: Wahlström & Widstrand. (Wergera pirtûkê ya erebî,îngilizî, fînî û spanyolî heye.)

Baker, Colin (1996), *Barnets väg till tvåspråkighet: råd till föräldrar och lärare i förskola och grundskola*. Uppsala: Påfågeln.

Hyltenstam, Kenneth (red.) (1996), *Tvåspråkighet med förhinder? Invandrar- och minoritetsundervisning i Sverige*. Lund: Studentlitteratur.

Hyltenstam, Kenneth (red.) (1999), *Sveriges sju inhemska språk -ett minoritetsperspektiv*. Lund: Studentlitteratur.

Hin rêberîyên din

Ji bo kesên ku îmkanên xwe yên înternetê hene (li pirtûkxaneyan ev îmkan heye), gelek agahdarî li ser duzimanîya di malbat û xwendegehê de hene ku mirov dikare jê sûdê werbigire.

Di derbareyê perwerdeya zimanê zikmakî ya di pêşdibistan û dibistanê de, mirov dikare gelek agahîyan di malpera “Temaya Zimanê Zikmakî” (Tema Modersmål), ku li ser “Tora komputerê ya xwendegehê” ye, de bixwîne. Hin beşên vê malberê bi kurdî ne jî
http://www.modersmål.skolutveckling.se

Beşên bi kurdî:
http://www.modersmål.skolutveckling.se/kurdiska

Agahdarîyên pirtir li ser “swêdîya wek zimanê duyem” mirov dikare di malperan de bibîne. Ji wan yek jî malpera Nevenda neteweyî (Nationellt centrum) e.
http://www.lhs.se/sfi

Innehåll och utformning
av denna broschyr
har utarbetats av
Språkforskningsinstitutet i Rinkeby
i samarbete
med föräldrar, förskollärare och lärare
och med forskare vid
Centrum för tvåspråkighetsforskning,
Stockholms universitet.

Institutet tackar dem alla varmt
för värdefulla synpunkter!

Myndigheten för skolutvecklinghar bekostat
översättning och tryckning.

Naverok û forma vê broşurê; bi hevkarîya malbat,
mamosteyên pêşdibistan û dibistanê û lêkolînvanên
Centrum för tvåspråkighet, Stockholm
universitet (Unîversîteya Stockholmê),
ji aliyê Språkforskningsinstitutet i Rinkeby
ve hatîye amadekirin.

Enstîtuya me, ji bo vê alîkarîya wan ya giranbuha,
spasîyên xwe yên germ pêşkêşî wan dike.

Çûyinên vê bro urê yên ji bo werger û
çapê ji aliyê Myndigheten för skolutveckling
ve hatine dayin

TVÅ SPRÅK ELLER FLERA?

Råd till flerspråkiga familjer

De råd som ges i den här broschyren grundar sig på aktuell kunskap om barns tvåspråkiga utveckling och bygger på de senaste forskningsrönen, förslag och synpunkter från föräldrar, pedagoger i förskola och skola och från forskare vid andra institutioner.

Råden är allmänna och passar många men kanske inte alla. Givetvis ska varje förälder välja det som känns naturligast och bäst i den egna familjen.

Broschyren är tvåspråkig och ges ut på svenska samt albanska, arabiska, bosniska, engelska, finska, somaliska, spanska,turkiska, kurmanji (nordkurdiska), arli (romani) och lovari (romani).

DU ZIMAN YAN JÎ PIRTIR?

Tawsîye ji bo malbatên pirzimanî

Tawsîyeyên ku di vê broşurê de hatine nivîsîn, li ser zanyarîyên aktuel yên di derbareyê pêşveçûna zarokan ya duzimanî, li ser bingeha lêkolînên ku di vî warî de hatine kirin, li ser pêşnîyar û fikrên dêûbavan, pedagogên pêşdibistan û dibistanê û lêkolînvanên ji enstîtûyên din hatine avakirin.

Ev tawsîye, bi giştî ne û li rewşa gelekan tên. Lê dibe ku li rewşa her kesî neyên. Helbet divê her dê û bav tawsîyeyên ku li rewşa malbata wan tên hilbijêrin û jê sûdê werbigrin.

Ev broşur bi du zimanan e. Bi swêdî û albanî, erebî, bosnî, îngilizî, fînî, somalî, îspanyolî, kurdî, arlîyî (romanî), lovarîyî (romanî) û tirkî hatiye weşandin.

MYNDIGHETEN FÖR SKOLUTVECKLING

SPRÅKFORSKNINGS-INSTITUTET i Rinkeby

STOCKHOLMS STAD